

See discussions, stats, and author profiles for this publication at: <https://www.researchgate.net/publication/366388496>

DÎROKA REXNE YA EDEBÎ YA KURDÎ LÎ ROJAVA

Article in *Mezopotamya Disiplinlerarası Çalışmalar Dergisi* · January 2022

DOI: 10.29228/mjis.66398

CITATIONS

3

READS

8

2 authors:



Rabeea Ismael Khalid Zebari
Knowledge University

11 PUBLICATIONS 9 CITATIONS

[SEE PROFILE](#)



Mehmet Veysi Babayiğit
Batman Üniversitesi

51 PUBLICATIONS 83 CITATIONS

[SEE PROFILE](#)

Some of the authors of this publication are also working on these related projects:



GÜNEYDE KÜRT EDEBİYATI ELEŞTİRİSİ TARİHİ [View project](#)



HISTORICAL ANALYSIS OF KURDISH LITERARY CRITICISM IN THE SOUTH [View project](#)



DÎROKA REXNE YA EDEBÎ YA KURDÎ LÎ ROJAVA

Lec. Rabeea Ismael Khalid ZEBARI¹
Assist. Prof. Dr. Mehmet Veysi BABAYİĞİT²

Anahtar Kelimeler	Kurte
Rexne ya Edebî Rexnegir Dîrok a Rexne ya Edebî Rojavayê	Rexne ya edebî pişkeke ji edebnasîyê ye. Çendîn qonax û çax derbazkirî ne. Li her qonax û çaxê de rexnegirî bi awayekê serederî digel têksta edebî kirî ye. Rolekê baş listî ye ji bo pêşxstina têkstên edebî. Çendîn teorî derketîne holê. Derketina her teorîyekê ji bo serastkirina şaşîyên teorîyên pêş xwe bû û li ser şaşîyên wan di sekînî. Heta roja îro guhartin di rexna edebî de di domin. Armanca vê lêkolînê ew e ku dîroka rexneya edebî li Rojavaya nas bike. Rojavaya (herwiha Rojavayê tê gotin), Başûrê Rojavayê, Başûrê Bîçûk an jî Binxetê, navê perçeya Rojavayê ye ku dikeve nav sînorên Sûriyê. Serbajarê herêmê Qamişlo ye. Dîroka rexne ya edebî li roj avayê ji bo çaxê kovara Hawar (1932-1942) dizivire, ku bizava rojnamevanî li rojavayê ji kovara Hawar despêdike. Çunkî hin nivîskarên mijarên rexne di nava rûpelê kovara Hawar de belavkirin weke "Hevindêsorî, Dr.K.Bedirxan, Cegerxwên". Îcar Her li hijmara yekem a Hawarê, ku 1932, gotarek bi navê "Edebiyata Welatî", li rûpelê 5. Ji bal Dr. Kamîran Alî Bedirxan bû.
Makale Bilgisi	
Araştırma Makalesi Gönderim Tarihi: 15.11.2022 Kabul Tarihi: 07.12.2022 Yayın Tarihi: 30.12.2022	

CRITICAL HISTORY OF KURDISH LITERATURE IN ROJAVA

Keywords	Abstract
Literary Criticism Critic History of Literary Criticism West	Literary criticism is being included in a part of literature. Although many stages and ages have been crossed; at every stage and stage, criticism is directly related to the literary text. It holds a crucial role in the development of literary texts. Besides, several theories are available for this purpose; however, the emergence of each theory was to correct the mistakes of the previous theories and focused on their mistakes. To this day, changes in literary criticism continue. The purpose of the current study is to find out the history of literary criticism in Rojava. Rojavaya (also called Rojava), South Rojava, South Little or Binkhet, is the name of the part of Rojava that falls within the borders of Syria. The capital of the region is Qamişlo. The history of literary criticism in the past dates back to the period of the journal Hawar (1932-1942), which started the journalistic movement in Rojava via the journal "Hawar". Since some writers published critical issues in the pages of Hawar journal such as "Hevindêsori, Dr.K.Bedirxan, Cegerxwên", an article called "Edebiyata Welatî", on page 5 was written by Dr. Kamîran Alî Bedirkhan in the first issue of Hawar in 1932.
Article Info	
Research Article Received: 15.11.2022 Accepted: 07.12.2022 Published: 30.12.2022	

ETHICS STATEMENT: No ethics statement is required

¹ Knowledge University, North Iraq, e-mail : rabeea.zebary@knu.edu.iq

² Batman University, School of Foreign Languages Turkey e-mail: m.veysi.babayigit@gmail.com

1. Destpêk

1.1. Têgehê Rexne ya Edebî

Rexne ya edebî di nav edebyata cîhanê de pir kevne. Weke hînek zanistên din li Yunanê destpêkirî ye. Ji destpêkê rexne li Yunanê bi awayekê sade despêkirî ye. Paşan hêdî hêdî gihurîn û pêşkeftin bi serde hatîne. Hata ku li ser destê feylesofê Yunanî “ Eristo “ bi awayekê tiyorek a eşkere berçav bû ye. Di wî çaxî de hinekan têgehê rexne weke şirovekirinek ji bo têkist a edebî kar anî ye. Herweha hinekên din têgehê rexne weke li gorey hinek pîverên civakî û rewîştî ji rexne di nêrî. Ev wê yekê xwe ya dike têgehê rexne ya edebî ji wate û hizir û boçûnên sade destpêkirî ye (Zebari & Babayiğit, 2021a).

Paşan wate û ramanên berfirehtir û ji hev cude û alîyên cudatir ji xwe re girtîne. Di kevin de rexne weke dibistan û rê û rêbaz tune bû, belku digel felsefê de bû yan beşek bû ji felsefê re, her ji çaxê Yunanî ên kevin de rexne ya girêday bû ji felsefê re, lê belê çaxê nû de rexne pitir girêday bû ji îstatîka yê re bû, ku leqek bû ji leqên felsefê re. Paşan rexne ji zanstên mirovî re girêda bû. Anku rexne sûd ji zanstên mirovî re wergirt weke dîrok, pisikolojî, dîrok û civakî û hwd. Îcar ji encamê vê yekê rexne ya dîrokî, civakî û pisikolojî û hwd derketin holê (Salih, 2010).

Rexne ya edebî ji çaxekê kevnar de he bû. Anku piştî peydabûna berhemê edebî dikarin bibêjin rexne ya edebî weke pêwîstîyek hat holê. Lê belê bi awayekê ekadimîk tune bû. Ji despêkê de rexne ya edebî girêdayî hest û sozên mirovî bû ji hember bûyerên xweş û ne xweşên jiyane de. Îcar ev yek bo eger ku mirov li gorî bîrûboçûnên xwe rexne bike (Ehmed, 2009), pir guhartin li ser rexne ya edebî hatin encamdan, lê belê bi awayekê ekadimîk dîroka rexne ya edebî ji Sê qonaxan de derbazbû ye.

1.1.1 Qonaxa Yekê: Rexne ya Kilasîkî

Ji rexne ya çaxê Ersto û Pilaton jê re di hê gotin rexne ya kilasîkî (Cuqî, 2016). Ev Qonax ji çaxê 18'an de destpêdike. Di vî çaxî de ji bo şirovekirina berhemê edebî ji bal rexnegiran ve bi awayekê sereke giringî bi nivîskarî di hê dan (Ebdulrehman, 2014). anku bi awayekê din civak, dîrok, piskolojî û jiyana nivîskarî dikirin rêyek ji bo şirovekirina têkista edebî (Nihêllî, 2019). Ev yeke di teoriya dîrokî, civakî û pisikolojî di hê dîtin (Qadir, 2009). Rexne ya Kilasîk wan teoriyên rexne ji xwe re digirin ên giringî bi alîyê dervey têkstê di den. Weke van egeran Dîrokî, civakî, siyasî, aborî, Jîngeh û pisikolojî hwd. Li gorî rexne ya kilasîkî rexnegir têkista edebî bi rexnegvedana van egerên navbûrî girêdi de. Anku ew egerên bandor ji nivîskarî kirin ku têkstê bi nivîsî ne. Îcar li vir de pêwîst e rexne ravekirin be, bê ku biryarê bide. Erkê rexnegir li vir ew e, ku lêkolînê ji wan egeran bikê ên bandor li ser nivîskarî kir be, ku berhemî binivîsîne. Herweha peywendî ya nivîskarî bi têkstê û dewr û ber ve eşkere bike. Ev ji bo wê yekê ye, ku alîyên veşartî di têkstê de eşkere bikin. Bi ewê watayê ku têkst edebî rexnegvedana jiyana ya nivîskarî ye û hin çar tîkên encamê serbora nivîskarî ye digel digel civakî (Cuqî, 2016) . Herweha hin rexnegir wesa di fikrin heta mirov ji tîksta nivîskarî fêmbike. Pêwîsta ji nivîskarî fêmbike. Anku bi awayekê din pêwîst e şarezahî li ser jiyana nivîskarî bi awayekê giştî hebe heta bikare ji tîksta fêmbike (Warîn û Wêlik, 2008). Li gorî Rexne ya Kilasîkî rexnegir ji tîksta despêdike û li ser naveroka tîksta de di sekinîn. Lê belê ji tîksta de bi dawî nahê. Beku ber bi alîyê dervey tîksta diçûn û bi tinê berhem dikir xala despêkê. Lê belê xala navend û dawî ji karê wan li dor nivîskarî yan jîngê û rewşa nivîskarî bû (Warîn û Wêlik, 2008).

1.1.2 Qonaxa Duyê: Rexne ya Modirên

Ev qonax ji çaxê 20' an de despêdike. Di vê qonaxê de guhartin di rexne ya edebî de hatin kirin, ku mirina nivîskarî ji bal Rolan Bart hat ragehandin (Warîn û Wêlik, 2008), wate li cihê ku lêkolîn li ser nivîskarî bi hê kirin, baştir dibe ku lêkolîn li ser xeber û tîksta nivîskarî bi hê kirin. Bi wê yekê ku tîksta bi xwe canekê xweser e û cuda ye ji canê nivîskarî her weke di teoriya Şêwazgerî, Bunyadgerî, Formalîzîm û hwd xwe ya dibe (Qadir, 2009). Rexne ya modirên tîksta edebî weke sîstemekê xweser û dîr ji nivîskarî didanin. Lêkolînê ji esasê ziman û ciwanî ya wê dikin. Ji her egerkê dervey tîksta dîr di êxin û giringî bi sîstemê tîksta didin. Di rexna modirên de deshelata nivîskarî li ser tîksta namîne û mirina nivîskarî di hê ragehandin. Îcar peydabûna rexna modirên ji bo serastkirina rexne ya Kilasîkî bû (Zebari & Babayiğit, 2021b).

Çunku lêkolînên Rexne ya kilaskî ji edebiyatê dûr ketin. Li gorî rexne ya modirên têkst a edebî dikare watayeka tam- bide. Bê ku giringî bi aliyê dervey têkstê bidin. Rexnegirên modrên ji berhemê edebî despêdikin û ji berhemê edebî bi dawî dihên. Çunku li gorî boçna wan berhem bi xwe dikare nuneratiya xwe bike û xwe bi dest xwendinên hemereng û cuda cuda berde dûr ji nivîskarî û rewşa berehê edebî tê de peydabû yan ew jîngeha nivîskar tê de jiyay (Cuqî, 2016). Rexne ya modrên li bin bandora teorîya zimanvanî ya nû peydabû. Penayê dibe ber zimanî bi ewê watayê, ku ziman sîstemekê serekî ya têksta edebî ye. Lewre aliyên zimanî kirin esas ji bo lêkolînên xwe û peyv bi peyv vedikolin û giringî bi dúbare xwendinê didin. Li gorî rexne ya modrên dûpatkirdinewey yan tîpêk bo çend caran dibe watayeka teybet bigeyînê û aliyên veşartî eşkere bikin (Gerdî, 1974). Rexnegir li ser esasê sîstemê têkstê kardike lêkolîna xwe dike. Ev hemû ji bo hewldane ji bo wesif û şilovekirina têkstê ye. Ew tiştê giring bawerî ji re heye xwe dûr kirine ji biryardanê. Çunku biryardan xwendevanî ji dúbare xwendina têkstê dûr dike û hêza vedîtina lawaz dike û dibe ew biryardana rexnegirî li ser têkastê şaş be. Rexnegir li gorî rexne ya modrên li bersiva van pirsan digere weke berhemî tu mijar heye ? çima ev mijar heye ? çima mijareka din tune ye ? Bi tu awa qala mijara xwe kirî ye ? çima bi awayekê din qala mijara xwe nekir ye ? û hwd. Ev ji wê yekê, ku têkst nuneratî ya xwe dike û pêwîstî bi egerên dewrûber tune ye. Têkst senter e. Ji ewan teorîyên rexne ên lêkolîna xwe li ser têkstê bi xwe dikin. Ew jî : “ Formalistên ros, Rexna Nû, Binyadgerî, Simyolojî û hwd (Cuqî, 2016).

1.1.3 Qonaxa Sêyê: Rexne ya Post Modirên

Di vê qunaxê de pitir guhartin di rexne ya edebî de hatin holê. Çunku nivîskar û têkist her dû bi hev re hatin pişgohavêtin. Li cihê wan giringî bi xandevanî hate dan, wate xwendevan çewan têkistê di bîne wesa di xwîne û şirovedike (Ebdulrehman, 2014). Ev yeke di teorî ya (Helweşangerayî, Hêrmonofîk, teorîya wergirtinê û hwd eşkere dibe. Li gorî van teorîya rexne têkista edebî her dema gehiştê destê xwendevanî, wî çaxî nivîskarî tu mafek ji têkstê re tune ye (Cuqî, 2016). Di rexne ya post modrên de wergir sentere. Çunku di karê rexne de eger kesek tune be têkistê bi xiwîne û şirovebike. Wî çaxî têkstê tu giringî tuna be. Giringî didin mewdayê bandora têkstê li ser wergirî û eşkerekirina peywendî ya di nava wergirî û têkistê de dûr ji nivîskarê têkstê. Her weke ew dibêjin:” *Xwendevan azade bi tu awa jê re fêmbike û şirovebike*”. Bi vî away têksta edebî xwendineka zatî ye. Bi vî away têkst û wergir watayê eşkere dikin. Çunku wata bi tinê di nava hizir û bîrên xwendevanî de tune ye. Belku di nava xwendevan û têkstê de jî heye. Îcar li gorî çax û astê fêmkirin û paşxana xwendevanî, xwendevanî watayên ji hev cuda ji têkstê re eşkere dike. girnge wê yekê eşkere bikin, ku corekê din ê rexne heye, nakeve bin van her sê qonaxan de. Ew jî Rexne ya Rewenbîrî (Cultural Criticism) ye (Zebari & Babayîğit, 2022). Li gorî vî corê rexne wataya berhemê edebî eşkere na be dûr ji civak û dîrok ê. Çunku edeb ji civak, dîrok û rewşenbîrî ye nahê cudakirin.

2. Dîroka Rexne ya Edebî li Roj Avayê

Destpêk û qunaxên bingeîn ji wêjeya gelê bênasname li “ *Rojava/ Kurdên Sûriyê* “, bi regekî panoramî ji we re raxînim ber çavan. Ev destpêkên ku di qunaxên giring re, di ber dergehên dîrokê de, derbas bûne û wiha di rêka van destpêk û qunaxên bi ronî dayî re, em ê derbasî nav rûpelên tevgera wêjeya kurdî a iroyîn bibim. Îcar ji bo vê yekê Konê Reş dibêje:

“*destpêka wêjeya Kurdî a nivîsandî, li weşandina rojnameya dayik (Rojava: 1898) vedigere, ewa ku mîr Miqdad Bedîrxan di sala 1898an de li bajarê Qahîre/Misrê di weşand. Ji wê hingê ve zimanê kurdî bûye zimanê nivîsandina pexşanê*” (Konê Reş, 2017).

Dîroka rexne ya edebî li roj avayê ji bo çaxê kovara Hawar (1932-1942) dizivire, ku bizava rojnamevanî li rojavayê ji kovara Hawar despêdike. Çunku Hin nivîskaran mijarên rexne di nava rûpelê kovara peyv de belavkirin weke “*Hevîndêsorî, Dr.K.Bedîrxan, Cegerxwên*”. Îcar Her li hijmara yekem a Hawarê, ku 1932, gotarek bi navê “*Edebiyata Welatî*”, li rûpelê 5. Ji bal Dr. Kamîran Alî Bedîrxan bû. Îcar nivîsên wî li dor pêlewaz û dengên di helbesta kurdî. Li despêka gotara xwe de Edebiyatê pênasdike û dibêje:

“*Edebiyata Welatî ji, ew edebiyate ji jîna mîletî, ji hiş û dilê mîletî, ji hiş û dilê wî, ji dîrok û çirçîrokên wî, ji stran û lajeyên wî xwe digire. Kanîya wî, dilê mîletî, hiş û heyala wî ye. Tinê ev edebiyate*” (Cewahiri, 1998a).

Kamiran Ali Bedirxan gava behsa “*edebiyata welatî*” “dike pêşengê vê edebiyatê Xanî dihesibêne:

“*Ji xwe Ehmedê-Xanî berî sêsed salî vê rêyê ji me re veqiri bû. Lê heyf paşiyên wî pê ve ne çûn*”, *Birayê Kamiran, Celadet Bedirxan jî ji bo Xanî wiha dibêje: “Belê Xanî jî xudan kitêb e. Lê Xanî pêxember e jî. Pêxemberê diyaneta me a milî, pêxemberê ola me a nijadîn”* (Cewahiri, 1998a).

Herweha di aliyekê din de daxwaz a wê yekê dike, ku pêwîste em bi zimanê da û bavan binivîsînîn, Anku bi zimanê kurdî berhemê xwe binivîsînîn. Ji bo vê yekê li sr helbesta Ehmedî Xanî de di sekine, ku Xanî pêşî sê sed salan ev daxwaze kir bû, dema dibêj:

“*Divêt em bi zimanê da û bavan xwe, bi zimanê şîrîn û delal, bi zimanê kurdî binivîsîn in. Xanî ev rê ji me re vekirî bû. Lê heyf padşahên me pê ve ne çûn Xanî ji xurtîya bêj wê gavê hesiya bû ji peyta jêrîn de di xwest bide zanîn,*

Saqî şemrandin vexwar durdê,

Mavendê derê lîsanê kurdî” (Cewahiri, 1998a).

Herweha nivîskarekê din Hevend Sorî di jimare 5-7- 8 de gotareka rexnê bi navê “*Edebiyata Kurdî*” belavdike, ku di vê gotarê de nivîskarî qala teorî ya edebî, dîroka edebî û rexne ya edebî kirî ye. Edebiyata kurdî dike beşek ji edebiyata gelên Arî. Çunku gelê kurd ji gelên Arî ne, dema dibêje :

“*Hemû xwendewaranî Hawarî xoşewîst dezanin, ku gelê kurd gelekê Arî ye, yahnî Hindî-Ewropî ye. Le ber ewe ziman û edebî kurdî weke ziman û edebiyatî dikey Arî ye. We edebiyata kurdî le edebiyatî Faris, Hindî, Yunanî Kon, Rûsî, Ferensî, Elmanî...h.p. zor deqal*” (Cewahiri, 1998a).

Herweha paşan dihê edebî ji me re pênase bike, ku ji bal wî pêwîste bandora xwe li ser xwendevanî bike. Îcar ew bandor ji xwendevanî re xweşî yan ne xweşî çêbike, dema dibêje :

“*Edeb pêkhênan û gotinî mêşk û fikrî însane, çeşnêkî xweş û ciwan ke tesîr bikat li ser insan , aya insan xemgîn û diltenng dekat yan ferahink û dil xweş keyfdar dekat.*

Edebiyat ew şitaneye ke dilî insan gird debête we û dêt û deçêt derîdekate derwe we û deylêt be zimanêkî şîrîn û ciwan” (Cewahiri, 1998a).

Herweha CegerXwên di jimara 22 an de gotarek belavkir ye bi navê “*Hespên Xweşxwanên Kurdî*” kirî. Îcar nivskar di gotara xwe de qala Kêşa Birgeyî kirî ye, ku Kêşa reswna kurdî ye. Çiwar core kêş eşkerekirîne, ew jî “*Çeleng, Laxer, Sivik, Rewan*” û li cihê peyva Derya yan Bahir peyva Hesip kardi îne (Tiha, 2002).

Dengê Xanî di sed sala 19’ de bi Hacî Qadirê Koyî ji nû ve olan dide. Herekol Azîzan di “*Kovara Hawarê*” de ji bo wî dibêje:

“*Hacî Qadirê koyî Xaniyê didowan e. Ew jî weke Xanî bi derdê mîletê xwe dişewitî. Şehir û qesîdeyên wî tev de li ser mîlet û welêt in*” (Cewahiri, 1998b).

Koyî hem pesnê Xanî û Mem û Zînê dide hem jî peyamên Xanî -li gor şertên nû yên cîhanê tîne zimên. Herweha ji bilî kovara Hawar emdikarîrîn bibêjîn kovara Ronahî(1942- 1945) û rojnama Roja nû(1943-1946)û rojnama Sitêr (1943-1945) rol ji bo pêşxistina edeba kurdî bi awayekê giştî listî ye û rexne ya edeba kurdî jî vê yekê bê behir tune bû ye. Ew nivîskarên gotar û lêkolîn di van kovar û rojnaman de belavdikir ev in : “*Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Dr. Nûrdîn Zaza, Mele Ehmed Namî û Reşîdê Kurd û gelek kesên din.. Hem jî gelek ji nivîskarên Rojavaya başûr û rojhelat jî di kovara Hawarê de nivîsandine wek: Tewfîq Wehbî, Goran, Pêrût, Bêkes, Hevindê Sorî, Şakir Fettah.. û ji rojhelat Îhsan Nûrî paşa*”

Di roja 17-04-1946’an de, piştî ku Firensî ji Sûriyê hatine derxistin, gelek kelem û asteng li pêşiya kovar û weşangeriya bi zimanê kurdî de li Rojava hatine danîn. Ji wê hingê ve zimanê kurdî qedexeyê, nivîsandina bi zimanê kurdî qedexeyê ye, ta ku nivîsandinên bi zimanê erebî li ser kêşeya kurdî qedexeyê û wiha ev qedexebûn berdewame ta roja îro (Konê Reş, 2017). Lê belê tevî van qedexeyên dijwar rewşenbîrên kurd li Rojava li ber xwe dane, ji desthîlanîn neketine û di navbera salên 1954 û 1956an de çend pirtûkên bi zimanê kurdî û yên bi zimanê erebî li dor kêşeya gelê kurdî di nav kurdên Rojava

de çap û belav kirine wek: “(ZEBARI, HUSEEIN, ABDULRAHMAN, AMEEN, 2022, R.130). dîwana Apo Osman Sebrî (Bahoz) û (Derdên me) “ di gel Elfabeya wî ya tekûz, hem jî pirtûka “ Çend rûpel ji wêjeya kurdî ” ya rehmeti ya Rewşen xanim Bedirxan û di sala 1958’an dîwana melayê Cizîrî weşandine. Di wan salan de jî bîranînên Dr. Nûrî Dêrsimî li Helebê capkirine û di heman kat de hatiye qedexa kirin, di gel dîwana Cegerxwîn ya duwemîn û wiha heyamekî bêdengi yê di wan çend salan re di ser weşangeriya kurdî re derbas bû ye. Ev hewildan tev ji rex şagirtên kovara Hawarê ve hatine kirin wek: “ Nûreddîn Zaza, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Rewşen xanim Bedirxan û hin kurdperwerên bîrewir wek: Reşîd Hemo, Hemîd Derwêş, Mihemed Alî Xoce, Xelil Mihemed û hwd “ Bi kurtî em dikarin bibêjin rewşa rexna edebî ya lawaz bû.

2.1 Qonaxa salên 1960- 1979’de:

Ta ku di roja 14-06-1957’an de Partî Demokrat a kurd li Sûriyê (P.D.K.S) hati ye damezirandin. Vê partiyê di sala 1960’an de, rojname ya Dengê Kurd bi kurdiya latîni diweşandin. Ev rojname Dengê Kurd, ji rex komîta navendî a Elpartî (P.D.K.S) di navbera salên 1960 û 1964’an de bi kurdi ya latîni derketi ye û ji kesên ku têde dinivîsandin ev bûn; “ Dr. Nûreddîn Zaza, Osman Sebrî, Reşîd Hemo, Cegerxwîn û Hemîdê Derwêş “

Di sala 1968’ an de, piştî 23 salan di ser rawestandina kovara Hawar û Ronahiyê re, 23 salên ji bêdengiyek wek mirinê ku di ser ziman û ferhenga Kurdî re derbas bû, seydayê Cegerxwîn ji nû hewilda ku wê valahiya dagire û wiha dest bi weşandina kovareke xurû Kurdî, bi tîpên latîni. Ew kovar navê wê(Gulistan)bû.Gulstan: Kovareka teorî û edebî ye, Hejmarê pêşîn ji vê kovarê li meha huzeranê de 1968’ an de hatî ye weşandin. Serkêş a wî seyîdayê Cexer Xwên dikir. Hejmarên pêşîn de ji 12 rûpelan ta bi 24 rûpel bûn. Naveroka wê bi piranî ji helbestên CegerXwên bûn. Li ser bergê kovara Gulstan hijmara 38, ku li zivistana 2009’an de, pênasên kovarê weha hatî ye pênasekirin: “Kovareka Wêjeyî û Civakî ye ”, lê li ser bergên hejmarên pêşîn manşêta pênasekirina kovarê weha hatîye nivîsandin, “ Kovarek toreyî û edebî ye . Hem jî kovarek torevanî û Civakî ye!. “ Îcar evê kovarê xizmet ji bo rexne ya edebî kirî ye (Konê Reş, 2014).

Herweha van kovar û rojname rol hebû ji bo pêşxstina edeba kurdî û rexne ya edebî ew jî: “ Kovara Agehî, Gelawêj hwd “.

2.2 Qonaxa salên 1980- 2000’ an de:

Di destpêka sala 1980 an de, piştî derbe ya 12 êlûna 1980’ an de, karwanê rewşenbîrî ji Rojavaya bakur û başûr, ji ber zilm, zor û sitemkariyê ve, xwe berdand nav kurdên Sûriyê. Bi hatina wan re qunaxeke din, roleke taybet di hola wêjeya Kurdî de li Cizîra Binxetê hat danîn. Hingê gelek ji qatên eknteketul û enteljinisya Kurdî, xwediyên xwendina bilin ji zankoyên Şam û Helebê, xwe berz û eşkere kirin û wiha wêje ya Kurdî ji nû ve vejîya û geş bû û bi rengekî taybet piştî vegera rewşenbîrên me yê ku li dervî welat dixwendin. Hin ji wan bi livandinek rewşenbîrî rabûn û berî her tişt dest bi hînkirina zimanê kurdî kirin(Hamad, 2018, r.1141).

Ji rexekî din ve, em dikarin bibêjin, ku bi hatina rewşenbîrên Kurd ji komara Ermenistanê – Sovyeta berê– rolek wam jî hebû. Ew helbestvan û nivîskarên Kurd yê ku ji Ermenistanê hatin Cizîrê rolek baş listin di şiyarkirina rewşenbîrên Cizîrê de. Ew hay kirin ku çavên wan li pêmayên bav û kalên wan be, li kultur û folklorên wan be û şîreta wan ya herî buha û zêrîn ku guhdariyê li zimanê Kurdî bikin, ji wan: “ Dr. Celîlî Celîl, Ordîxan Celîl, Tosinê Reşîd, Eskerê Boyîk, Şeref Aşîriyan û Elî yê Ebdirehman û gelekên din”. Herweha di vê qonaxê de çend rojname û kovar derketin, ku wan rojname û kovaran rol ji bo pêşxstina edeba kurdî bi awayekê giştî hebû, û rexne ya edebî ji vê yekê bê behir tune bû, ew jî ev kovar in: “ Stêr, Xunav, Gurzek Gul û hwd ” (Konê Reş, 2017). Di vê qonaxê de xebata kovara Stêr eşkere ye. Di sala 1983’an de hijmara wê ya yekê derket. Stêr kovareka çandî, zimanzanî, wêje yî, zargotinî, folklorî bû û pitir bala xwe dida zimanê kurdî û pisrgirêkên wê. Herweha, beşek taybet ji bo hevpeyvînan amade kir û gelek hevpeyvînan giranbuha lidar xist bi wêjevan û kesayetiyên Kurd re weke: “ Mihemmed Emîn Bozerselan–Konê Reş–Rewşen Bedirxan û Celîlê Celîl û hwd ".Îcar di van hevpeyvînanê nivîskaran bîr û boçûnên xwe li ser rewşa edeba kurdî eşkere dikirin, Stêr ê xebateke mezin pêkanî (Mistefa, 2019).

Ji sala 1990'an û bi vir de, hinekî çavgirtin ji çapkirina pirtûkên bi zimanê kurdî hat girtin. Di wan salan de gelek dîwan, kovar, pirtûk hatin weşandin, ew jî bi dizî û heger bi hatina girtin cezayê wê mezin bû, lê ji berî çend salan ve, nexasim piştî yasayên çapemeni yê di Sûriyê de derket, ew rêka çûk jî ji ber me hat girtin, tevî ku di wan salan de me berhemên xwe li Şamê çapdikir û li ser datanî li Beyrûtê çap bû ye. Xwediyên weşanxaneyanî gelek pere ji me distandin, bi behana ku ew tiştêkî qedexê ji me re dikin. Îcar em ji neçarî çavê xwe berdidin rojavaya başûr û dervî welat “*Eurûpa û Stenbolê*”, ku em li wîr berhemên xwe çap bikin, hem ji ber qedexbûna ziman û hem ji ber buha yê çapkirinê (Konê Reş, 2017). Herweha ew rojname û kovarên ji 1990'an de derketin holê ev in: “*Zanîn, aso, pirs, bihar, rojda, roj, jîn, zevî û hwd*” xebat ji rexne ya edebî re kirin. Herweha çendîn perûk li ser edeba kurdî derketin holê ew jî di wan kovaran de û di hin pirtûkan de rexne serê xwe bişermînî rakir. Jan Dost, pirtûka xwe ya li ser kilasikên kurd, bi erebî di salên nîva heştê de. M. Deham Ebdulfetah, li ser pêlewazên kurdî, li destpêka salên 1990î de nivîsî. Di kovaran de, Mamomste Rezo Osê, Azad Elî, Ebdulsemed Daoud, Heyder Omer, M. Berzo, Tengezar Marîni û hd. Mamoste Heyder, Ev pirtûk nivîsîn: Pirtûka xwe ya li dor Xanî û Memo û Zîna wî, bi erebî. sala 1991ê de weşand. Li dor Feqiyê Teyran û şeweyê nivîsinê 1993, bi erebî, 2003 Cegerxwînê çîrokvan, 2004 Osman Sebrî helbestvan û nivîskar û li dûv re, pirtûkên erebî wergerandin ser kurdî. Lê pirtûka ya bi metod, rêbaz, û piştîpartin bi zanista edebiyatê,

Li sala 2011'an de Roj Avayê kete di qonaxeka nû de. Çunku ji bin zilim û sîtema develeta Sûrî derketin. Îcar ji encamê vê yekê dibistîyan û zanîngeh bi zimanê kurdî derketin. Herweha çendîn rojname kovar derketin weke “*Welat, pênuş û hwd*”. Herwehaha vebûn a zanîngeh û pemangehan û hebûn a be a ziman û wêjeya Kurdî, Ji encamê ve yekê lêkolîn û rexne ji baştir bû ji qonaxên pêş xwe. Lê belê rexna edebî her a lawaz be.

3. Encam

Dîroka rexne ya edebî li roj avayê ji bo çaxê kovara Hawar (1932-1942) dizivire, ku bizava rojnamevanî li rojavayê ji kovara Hawar despêdike. Çunkî Hin nivîskaran mijarên rexne di nava rûpelê kovara peyv de belavkirin weke “*Hevindêsorî, Dr.K.Bedirxan, Cegerxwên*”. Îcar Her li hijmara yekem a Hawarê, ku 1932, gotarek bi navê “*Edebiyata Welatî*”, li rûpelê 5. Ji bal Dr. Kamîran Alî Bedirxan bû. Îcar nivîsên wî li dor pêlewaz û dengên di helbesta kurdî. Li despêka gotara xwe de Edebiyatê pênasedike û dibêje.

Çawkanî

- Cewahiri, F. (1998a). *Hawar Cild 1-23 (1932-1933)*, Weş. Nûdem, Stockholm.
- Cewahiri, F. (1998b). *Hawar Cild 2, J. 24-57(1934 – 1943)*, Weş. Nûdem, Stockholm.
- Cuqî, Î.N. (2016). *Şî'r û Mêjû*, Ji weşanên dezgehê Sipîrêz, Weş. Matris, Turkiye, r. 25.
- Ebdulrehman, F. (2014). *Çemkî Felsefey lêgdanewegerayî le Rexney Edebî da*, K. Nuser, J.10, Weş. YNK-Silêmanî, Silêmanî, r.6.
- Ehmed, H. S. (2009). *Rehendî Rexney komelayetî le Şî'rekanî Hacî Qadir û Bêkes da*, T. Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, Hewlêr, r. 6.
- Gerdî, E. (1974). *Rexne û Edeb*, Weş. El- Hewads, Ç.1ê, Bexd.
- Nihêllî, N. H. (2019), *Deravek ji Rexnê (Rexne û Vekolîn)*, Iraq.
- Salih, A. K. (2010). *Rexney komelayetî û Piraktîzekirdinî le Şî'riekanî Goranda*, T. Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, F. Ziman, Hewlêr, r. 6-7.
- Tiha, A. Î. (2002). Rengvedana Edebî di Kovara Hawar da 1932- 1942, Ji weşanên Dezgehê Aras, Weş. Wezaretê Perwerde, Hewlêr.
- Qadir, R. X. (2009). *Mêtodî Rexney Tewawkarî(El-Tekamîlî) le Rexney Edebî Kurdî da*, T. Lîsansa Bilind, Z. Selahedîn, F.Ziman, Hewlêr.
- Warîn, O., û Wêlik, R. (2008). *Tiyorya Wêjeyî*, Wer. Dr. Arif Hîtu, Weş. Hawar, Duhok.

Zebari, R. I. K. & Babayiğit, M. V. (2021a). *KÛRT GAZETECİLİĞİN EDEBİYAT ELEŞTİRİSİ ÜZERİNE ETKİSİ: 1991-2003 GÜNEY IRAK ÖRNEĞİ*. *Mesopotamia Journal of Interdisciplinary Studies*, 1(1), 68-76. DOI: 10.29228/mjis.54692.

Zebari, R. I. K., ve Babayiğit, M. V., (2021b). Peyv" Dergisinin Çeşitli Metinlerinde Edebi Eleştirilerin İncelenmesi, *Cihanşumul Akademi Sosyal Bilimler Dergisi*, 2 (3), 1-33.

Zebari, R. I. K., ve Babayiğit, M. V., (2022). Dîrok a Rexne ya Edebî ya Kurdî li Başûr. *Kadim Hikmet Uluslararası Bilimler Dergisi*, 6, 28-44.

ZEBARI, R.I.K , HUSEEIN. B. R, ABDULRAHMAN. L. M, AMEEN, S. T. M,(2022).*LÊKOLÎNEK LI SER ROJNAMEGERÎYA KURDÎ YA LI BAŞÛRÊ KURDISTANÊ*, Kurdiname, No: 7, R. 128

Hamad, K. H, Sovereign Immunity and Its Development in International Law, (2018), QALAAI ZANIST SCIENTIFIC JOURNAL, 1(3), 1141

Hevpeyvîn

Konê Reş, *CegerXwîn û Gulistan*, Qamişlo, 2014, Ji bo pitir zaniyarîyan bizivre Lînkî:www.welateme.info/kurdi/modules.php?name=News&file=article&sid=3610#.WVDOsJKGPIW.

Konê Reş, Hevpeyvîn, 27-6-2017- Sê Şeme.

Besam Mistefa, Rewşa Rojnamegerîya Kurdî li Roj Avayê, Ji bo pitir zaniyarî bizivre:<http://www.welateme.info/kurdi/modules.php?name=News&file=article&sid=483#.WVKMIJJ97IU>, 2019.

EXTENDED ABSTRACT

Similar to the other sciences literary criticism has also started in Greece; therefore, the date for that branch of literature is rather old. However, it may be asserted that critical literature was initiated in a simple way, afterwards it gained more sophisticated aspects in the world literature. In other words, there was no academic discipline or method about literary criticism at schools in ancient times, and it was considered as a part of philosophy; thus, human sciences such as history, psychology, social history, etc have benefited from it a great rate since then. This progress was described by the Greek philosopher "Eristo" in a clear theory explaining that some people used the concept of criticism as a commentary for literary failure; on the other hand, some of the others consider it in terms of various social and behavioural parameters; hence, simple ideas and concepts shaped it profoundly. Since literary criticism is being included in a part of literature as a necessity and each stage is directly related to the literary text, it holds a crucial role in the development of literary texts. Besides, when the changes and concepts for literary criticism are taken into consideration, it may be assumed that the history of literary criticism has passed through three stages. The first one is named as classical criticism in which the critics give importance to the author in order to interpret the literary work or in another way, society, history, psychology and the writer's life are used as a way to interpret the literary text. This is also possible in historical, social and psychological theory because they investigate both external and internal aspects of a text in terms of historical, social, political, economic, environmental and psychological scopes. According to the classical criticism, the critic attempts to connect the literary text with the criticism and the task of the critic is to find whether the text has influenced the author or not; therefore, clarification on the author's relationship with the text and period are revealed to come up with the reflection of the author's life and relationship with the society. The second one is modern criticism which started in 20th century, and its purpose is to give importance to the text system in terms of language and semantic. Thus, it disregards external aspects in a text and attempts to find answers to some questions such as

why does this matter exist? why is there no other topic? how did you talk about your topic? Why didn't you talk about your topic in another way? etc. The last one is postmodern criticism which asserts that the meaning does not exist in the thoughts and memories of the reader. Perhaps it exists between the reader and the text. According to this type of criticism, the meaning of the literary work is clearly not far from society and history as literature cannot be separated from society, history and intellectuals. The purpose of the current study is to find out the history of literary criticism in Rojava. Rojavaya (also called Rojava), South Rojava, Small South or Binkhet, is the name of the part of Rojava that falls within the borders of Syria. The capital of the region is Qamişlo. Descriptive analysis has been employed in order to collect data about this period. It is found that the history of literary criticism in today's world dates back to the period of Hawar magazine (1932-1942), which started the journalistic movement in Rojava via Hawar magazine as some authors such as "Hevindêso, Dr.K.Bedirxan, Cegerxwên" published critical issues in the pages of the first issue of Hawar, which was released as an article called "Edebiyata Welati" in 1932. Then some more papers or articles were released but they were not successful and widespread. On 17th April 1946, when the French were expelled from Syria, many barriers and obstacles were placed for Kurdish-language journals in Rojava; therefore, the Kurdish language was restricted. However, despite these severe restrictions, the Kurdish intellectuals in Rojava resisted, they wrote several papers or books in Kurdish and Arabic between the years 1954 and 1956. It is also found that from 1960 to 1979, some more journals, magazines and books were conducted thanks to various political improvements. Besides, from 1980 to 2000, some authors conducted their best to write many literary papers, books or journals about Kurdish language though there were many political and social difficulties at those times.